**Hûn bi xêr hatin Pirtûkxaneya Bajarê Duisburgê!**

**Di derbarê me de**
Pirtûkxaneya Bajarê Duisburgê ji bo her kesî yek sazîyekê şaredarîyê ye û ji bo agahdarîyên derbarê çapemenî, agahdarîyên gelemperî û perwerdehîyê de, gihandina serbest pêşkêşî dike.

**Pirtûkxaneyên me**
Pirtûkxaneya Navendî, di navnîşana Steinsche Gasse 26, 47051 Duisburgê de ye. 13 şaxên pirtûkxaneyê hene ; 1 pirtûkxaneya mobîl (otobusa pirtûkan) heye, hûn dikarin navnîşanan, demên vekirina pirtûkxaneyan û plana rêwîtîya otobusa pirtûkan li ser malpera me ya înternetê de bibînin.

**Xizmetên me**
Em ew tiştên kû li jêr hatine nivisandin, pêşkêşî we dikin
- Ji bo deyn kirinê: dora 600,000 tiştên medyayê (pirtûk, kovar, agahdarî, lîstik, muzîk, fîlm, medyaya dîjîtal û hêj tiştên bêtir) ji bo komên hemî temenî.
- Ji bo bikaranîna tiştan di nav pirtukxanêyê de: Cîh û warên xebatê yên bi gihîştina Înternetê, WLAN, deverên xwendinê, rojname, odeya pêk anîna kar û barên muzîkê, cîhê tişt çêkirine, qada lîstikê, makînayên pêk anîna kopyayê.
- ji bo ceribandinê: çalakîyên ji bo zarok û mezinan, wekî mînak serdanên bi rênîşandaran ve, çalakîyên xwendinê, xwendin.

Di pirtûkxaneyên me de mayîn û di nav pirtukxanêyê de bikaranîna tiştên me, bêpere ne. Ji bo hin pêşkeş kirinan, ango xizmetên me (bi tiştên din va bi hevra, bikaranîna komputerên me, çêkirina kopyayan, veqetandina odeyên pêk anîna kar û barên muzîkê yên me) û ji bo deyn kirina tiştên medyayê, pêdivîya we hebûna yek nasnameya ji bo pirtûkxaneyê heye.

**Nasnameya ji bo pirtûkxaneyê**
Hûn dikarin li cem me, di nav pirtûkxaneyê de an ji li ser serhêl (onlîne) qeyda xwe bikin.
Ji bo qeydkirinê ji me re belgeyên jêrîn hewce ne:
- Nasnameya we an jî
- Pasaporta we bi belgeya qeydkirinê ya ji daîreya qeydkirina niştecîhan, an jî
- (di rewşên awarte de) destûra ji bo bi azad tevgerandine, an jî destûra mafê rûniştinê ( divê ew bi kêmtirîn ji bo 3 mehan derbasdar bin)

Nasnameya ji bo pirtûkxaneyê ji bo bikar anînê nikare ji kesên din re were dayîn.

**Mesrefên ji bo bikar anîna nasnameya ji bo pirtûkxaneyê**

- ji bo 12 mehan 20,00 €, ji bo kesên kû alîkariyên sosyal yên dîyarkirî, werdigrin 10,00 €
- ji bo 6 mehan 12,00 €
- ji bo 3 mehan 7,00 €
- ji bo 1 mehê 5,00 €
- ji bo zarokan / ciwanên heta temam kirina temenê 18 salîya jîyana xwe 0,00 €
- ji bo xwendekaran jin / xwendekaran zilam yên kû di yek dibistana perwerdeyî yê gelemperî, yê kû li Duisburgê de ye dixwînin, heta temam kirina temenê 25 salîya jîyana xwe 0,00 €
- ji bo xwendewanên li Zanîngeha Duisburg-Essen 0,00 €

Heke hûn nasnameya xwe ya ji bo pirtûkxaneyê winda bikin, divê hûn ji kerema xwe tavilê me agahdar bikin! Mesrefa nasnameya yedek 4,00 € ye.

**Muhletên deyn kirinê**
- di bingehê xwe de 28 rojan
- 14 roj (wek mînak pirtûkên ji bo guhdarî kirinê, CD, lîstikên konsolê)
- 14 roj ( wek mînak fîlm)

Ji kerema xwe agahdariya di derbarê muhleta deyn kirinê ya têkîldar de, li ser pelika muhletê ya xwe, binihêrin. Ger hûn bixwazin, emê kêfxweş bibin kû, vê muhletê bi E – nameyê bînin bîra we. Ji kerema xwe di vê derbarê de, bi me re têkilî daynin, an jî vê yekê di hesabê xwe de, dîyar bikin.

**Mesrefên lê zêde bûyî:**

- Derbas bûyîna muhleta deyn kirinê, ji bo her roj / tiştê medyayê 0,45 €
- Ji bo şandina yek agahîyekê bi postayê 1,00 €
- Kopya krin ji 0,10 €vir ve
- Daxwaz kirina yek tiştê medyayê ji yek pirtûkxaneyekê din 3,00 €

Ger tiştê medyayê winda bibin an jî zirar bibînin, hûn neçar in kû ji bo kû ew dîsa nûva were kirîn û were amade kirin, mesrefê pêdivî bidin.

Hûn dikarin hemû agahiyên girîng yên derbarê pirtûkxaneya bajarê de, li ser malpêra înternetê ya www.stadtbibliothek-duisburg.de bibînin. Li vir hûn dikarin hesabê xwe yê bikarhêner û kataloga me ya tiştên medyayê li ser serhêl (online) jî bibînin.

**Ji kerema xwe heke pirsên we hebin bi xebatkarên me yên jin û bi xebatkarên me yên zilam re têkilî daynin**